

## Nirxandin li Trafikskadenämnden'ê

Heger tu yan jî xizmekî te yê nêzîk di qezayeke trafikê de zîrar dîtibe, hingê Trafikskadenämnden (Encumena Zîrarên Trafikê) dikare tezmînata şirketa sîgorta we ya zîrarê binirxîne, muhakeme bike. Serlêdan û birêvebirina dozê li vê encumenê bi zîmanê swêdî pêk tê. Nirxandina dozê bêpere ye. Dîtin û lênerîna Trafikskadenämnden'ê ji şirketa sîgorteyê re şîret e. Trafikskadenämnden du celeb dozên diceribîne; dozên mecbûrî û dozên çareserkirina nakokiyên. Ev belgeya agahdariyê bi mijarên çareserkirina nakokiyên ve girêdayî ye.

### Dozên çareserkirina nakokiyên

Heger we biryara dawîn ji sîgorteya xwe, ya derbareyê tezmînata zîrara kesane ya ji sîgorteya trafikê wergirtiye û hûn ji biryarê ne razî ne, hûn dikarin ji bo vekolînê serî li Trafikskadenämnden'ê bidin. Doza we wê demê dibe dozeke çareseriyê nakokiyê.

### Ma ez dikarin bi xwe serî Trafikskadenämnden'ê bidim da ku doza min were muhakemekirin?

Berî ku hûn serî li Trafikskadenämnden'ê bidin, divê sîgorteya we li ser mijara ku hûn dixwazin biceribînin biryara dawîn dabe. Piştî wê, divê hûn bi sîgorteya xwe re jî têkilî daynin û hewl bidin da ku hûn derbareyê biryara ku hûn jê nerazî ne guhertinekê bidin kirin. Heger şirketa sîgorteyê biryara xwe neguherîne û hûn ji vê ne razî bin, hingê hûn dikarin muraceatê li Trafikskadenämnden'ê bikin.

### Nimûneyên ew pirsên ku hûn dikarin li ser wan daxwaza nirxandinê bikin:

- Heger pirsgerêkên we ji ber qezaya trafikê dest pê kirine yan na
- Asta seqetiya bijîjkî piştî qezaya trafikê
- Windakirina hatina piştî qezaya trafikê
- Pirsê we hatiye îptalkirin an na

### Trafikförsäkringsföreningen (Komeleya Sîgortayên Trafikê)

Heger doza we ji aliyê Trafikförsäkringsföreningen (TFF) ve tê birêvebirin, hûn nikarin rasterast serî li Trafikskadenämnden'ê bidin. Heger hûn ji biryarekê nerazî bin, her gav mafê we heye ku hûn biryarê ji hêla Trafikskadenämnden'ê ve biceribînin. Paşê hûn serî li TFF-ê didin, ku dozê ji bo vekolînê ji Trafikskadenämnden'ê re dişîne. TFF dê raya Trafikskadenämndens'ê ji we re bişîne.

### Nirxandin/muhakemekirin çawa dibe?

1. Hûn dikarin ji raya Trafikskadenämnden'ê re serîlêdanê dijîtal bikin an jî forma serîlêdanê çap bikin û bi posteyê bişînin. Hûn dikarin forma serîlêdanê li ser malpera Trafikskadenämnden'ê: [www.trafikskadenamnden.se](http://www.trafikskadenamnden.se) bibînin. Bi serîlêdana xwe re, divê hûn biryara sîgorteyê ya derbareyê mijara vekolînê jî bişînin. Li bendê bin ku hûn serîlêdana xwe bi materyaleke din re temam bikin heya ku ji we re bersiva sîgorteyê ya ji bo serîlêdana were. Paşê hûn biryar didin ku hûn dixwazin kîjan materyalê lê zêde bikin.

2. Mijara we tê qeydkirin û bersiva erêkirina serlêdana we dê ji we re we re tê şandin. Heger we BankID hebe hûn doza xwe bi dijîtalî li ser Mina Sidor (Rûpelên min) bi riya malpera Trafikskadenämnden'ê dişopînin. Wekî din, têkilî bi posteyê pêk tê.
3. Sîgorteya we bersiva xwe ji bo serlêdana we ji Trafikskadenämnden'ê re dişîne. Şirketa sîgorteyê belgeyên ku dixwazin li serlêdana li Trafikskadenämnden'ê pêşkêş bikin pêkve dişîne.
4. Gava we materyalan ji ber çav derbas kir, heger hûn bixwazin tiştêk lê zêde bikin hûn dikarin bikin. Bînin bîra xwe ku hûn tenê dikarin materyalên ku şirketa sîgorteya we dîtiye lê zêde bikin. Bo nimûne, heger hûn dixwazin belgeyeke bijîjkî ya nû bişînin, divê pêşî şirketa sîgorteya we li ser wê biryarê bide.
5. Trafikskadenämnden dê di civînekê de doza we binirxîne û paşê jî nêrînek tê nivîsîn ku encumen hatiye ser çî biryarî.
6. Piştî nirxandinê, dîtina Trafikskadenämnden'ê ji we û ji şirketa sîgortayê re tê şandin.

Dema serlêdana we li Trafikskadenämnden'ê ye hûn dikarin di her kêliyê de serlêdana xwe paşve bikişînin.

### **Nirxandina doza we li Trafikskadenämnden'ê çend dirêj dajo?**

Dema ku têkiliya di navbera we û şirketa sîgortayê de qediya, dê doza we di nav 90 rojan de were darizandin. Di hin rewşan de, dema pêvajoyê dikare were dirêjkirin.

### **Divê belge bi kîjan zimanî bin?**

Nirxandina li Trafikskadenämnden'ê bi zimanê swêdî tê kirin.

### **Erkên nûnerê qanûnî çî ne?**

Li Trafikskadenämnden'ê wekîlekî we dikare hebe ku li dema darizandinê alîkariya we bike, lê ev ne pêdivî ye. Heger we wekîlekî bivê, şirketa sîgorteyê ye ku biryarê dide ka Sîgorteya trafikê lêçûnên wekîlî bide yan na. Heger nede hingê divê hûn bi xwe bidin. Heger pêwîstî bi wekîlekî hebe, divê hûn wekaletê bo dozê amade bikin.

### **Gelo ez dikarim beşdarî civîna Trafikskadenämnden'ê bibim?**

Gava ku doza we tê darizandin hûn an nûnerê we nikarin li wir amade bin. Nirxandin tenê li ser bingeha belgeyên nivîskî ye, çêdibe.

### **Ma pêdivî ye ku şirketa min a sîgorteyê nêrîna Trafikskadenämnden'ê bişopîne?**

Trafikskadenämnden dîtineke nivîskî ya ku şewirmendî ye pêşkêş dike. Rastiya ku raman şewirmendî ye, tê vê wateyê ku şirketa sîgorteyê ne gerek e ku li gor pêşniyarê here. Lê tiştêk neasayî ye ku şirketa sîgorteyê li pey ramanê neçe.

### **Ma ez dikarim îtirazê li ser dîtina Trafikskadenämnden'ê bikim?**

Îtiraza li pêşniyara Trafikskadenämnden'ê ne mumkun e. Heger hûn ji pêşniyarê ne razî bin an jî şirketa sîgorteyê li gor pêşniyar bûye biryara xwe neguhezîne, hingê we derfet heye ku hûn li dadgeha giştî dozekê vekin. Biryara şirketa sîgorteyê ye ku di rewşên weha de dikare li dadgehê were darizandin û ne raya Trafikskadenämnden'ê. Dibe ku qaîdeyên îptalkirinê bicîh bibin. Ji bo bêhtir agahdarî li ser tiştên ku di rewşêke weha de derbas dibe, divê hûn bi şirketa sîgorteyê re têkilî daynin.

**Agahiyên bêhtir dikarin li ser vê malperê bibînin: [www.trafikskadenamnden.se](http://www.trafikskadenamnden.se)**